

Biryarnameya Giştî ya Navçeya Oldenburg

Ji bo Ragirtinê Nexweşiya Nefesê ya “Covid-19” ji hêla hokara nexweşiyê Koronayê SARS-CoV-2 Li Navçeya Oldenburgê ji 21.06.2021

- Guhartoya Kurt bi Zimanê hêsan -

JI 21.06.202-AN VE QANÛNIYE

Qedexeyên Têkiliye:

Li hindirê qada taybet (Apartman/Xanî/Milkê) de derbasdare:

Civîna li jûreyên girtî cudeyî ji xwedanê malê heya herî zêde 25 kes gengaz e.

Hevdîtinên li derveyî malê ji bo herî zêde 50 kesan cudeyî ji xwedanê malê gengaz e.

Zarokên têkildar ên heta 14 saliya, mirovên bi tevahî vaksînîkî û kesên xwedan tomarên tenduristiyê dikarin li wir bin.

Navendên lênihêrîna rojane ya zarokan/Zarokxaneyên rojane û dibistanan:

Çalakiyên birêkûpêk li baxçeyên zarokan û li hemî dibistanan, di nav de Graf-Anton-Günther-Schule (GAG) li Oldenburg jî, pêk tên.

Ajotin

Kesên ku wekî rêwî beşdarî civaka ajotinê ya profesyonel dibin divê di trêmpêlên ku têne bikar anîn, rûdankên pijîşkî li xwe bikin. Pêdivîbûna rûdankê di nav trêmpêlên taybetî yê bikar hatî de tu hewce tune, heke mirovên derveyî malbatê rêwîtiyê dikin..

Hewcedariya Rûdankê

Pêdiviya rûdankê, mînakî li bazara heftane û parkgehên supermarketan tu hewce nine.

Karantîne

Heke ceribandinek bilez a antigên erênî be, divê kesê têkildar li malbatê biçe tecrîdê di nav malê de û tavilê testa PCR bike. Heke testa PCR negatîf bibe, tecrîd bixweber bi dawî dibe. Divê beşa tenduristiyê bi e-peyamê bi corona@oldenburg-kreis.de an bi têlêfonê bi 04431/85-100 re were agahdar kirin.

Dikanên kel û pelan firotinê:

Dikanên kel û pelan firotanê bêyî hewceyê ceribandinê vekirî ye, lê rûdank hewce ye.

Gastronomî:

Gastronomî bêyî mecbûriyeta testê dikare hem li hundir û hem jî li derve vebe. Dibe ku rûdank tenê li cîhê rûniştek were rakirin.

Kombûnên saziyan di nav salonan/cejnên girtî bi hejmarek bêsînor a mirov dikare pêk were. Bûyerek ku zêdeyî 25 kes (li hundir) an zêdeyî 50 kes (li derve) hebe, testê mecbûrî ye. Dûrahî ji hev û rûdankê ne hewce ne.

Bar/Dîsko

Bi têgihek paqijiyê vebûn/vekirin gengaz e, ji mêvanan re testê mecbûrî ye. Dûrahî ji hev û rûdankê ne hewce ne.

Betlanê û werziş:

Tesîsên werzişê û hewzên avjeniyê vekirî ne.

Binpêkirinek ji van rêzîknameyên Biryarnameya Korona ya Niedersachsen li gorî paragirafa 19 ya Nds ya Biryarnameya Koronayê û Benda 73-an Beşa 1a Hejmara 24 a IfSG tawanbarek îdarî pêk tîne ku dikare bi cezayê pere yê heya 25,000.00 EUR were cezakirin.